Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1327 23-Mijdar-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 'Tedawiya gelêrî xwedîderketina li çanda kevnar e'

**Berçem Silêman/ Dêrik**

**Tedawîkarê gelêrî Elî Hacî Ehmed diyar kir ku karê tedawiya gelêrî weke çandeke kevnar e di nav civakê de ye û wiha got: "Ez bi hemû awayî hewil didim xwedî li vê çandê derkevim û wê biparêzim."**

Di dema berê de ji ber rewşa madî û nebûna derfetan herkesî berê xwe dida tedawiya gelerî. Karê keldana hestiyan, xelandina sêvok û movikan vedgere 150 salî ku ji nifşekî gihiştiye nifşekî din û heya roja îro jî gelek kes hene baweriya wan bi bijîşkan nayê berê xwe didin tedawiya gelerî. 3'ê kes di bajarê Dêrikê de dihatin naskirin ku bi vî karî radibin ew jî ev bûn; Evdê Hacî li gundê Robariya, Hesenê Kurdê li gundê Beroj û Hacî Ehmed li gundê Kasanê, ji herderî gel berê xwe dida wan.

Di derbarê tedawiya gelerî û şêwazên wê, tedawîkarê gelerî Elî Hacî Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

**'Hestekî xweş e mirov êşa derodê sax bike'**

Elî Hacî Ehmed da zanîn ku ew ji bavê xwe fêrî tedawiya gelerî bûye û wiha got: "Ez piçûk bûm ev kar bala min dikşandin, ji ber ku hesetekî xweş bû ku mirov bikaribe êşa derdora xwe sax bike. Lewma bavê min ji min xwest ku ez jî wek wî fêr bibim da ku destekê bidim gel û heya roja îro ez karê tedawiya gelerî berdewam dikim. Rojan e bi dehan kes berê xwe didim cem min, lê min wek pîvanekî deynaye pêşiya xwe berî ku ez kar bikim pêwîst e kesê nexweş çi dest be yan ling be wêneya tîrêjîn X bigre, da ku ez nas bikim derizandin têde heya yan na, heger hebe ez dest nadimê û berê wan didim cem bijîşkê hestûyan. Kesên temenê wan hîn negihiştibin 18 salî pêwîst e mirov gelek baldar be, ji ber ku heger bi şêwazekî şaş hat cebirandin, dibe ku movik ji bayê hev bikevin û dest yan ling seqet bibe, ji ber di wî temenî de hîn hestû mezin dibe."



**'Ez vî karî ji bo xizmeta civakê dikim'**

Hacî Ehmed axaftinên xwe berdewam kir û wiha got: "Amûrên ku em pê kar dikin heger dest yan ling be gelekî ji hev ketibe yan şikestibe em zerika hêkê û nokan dihêrin datînin ser çapûn, heger zarok bê em 15 rojan dest yan ling pêçayî dihêlin, heger temen mezin be mehekî dimîne. Dema şikestin nebe em lizqeya bayê datînin yan nêrobendê digrin derdora wê, şaş û darikar datînin derdora wê û dibêçin. Dema ji cihderketin be em careka din vedgerînin cih de û em ji kesê nexweş re dibêjin pêwîste karê giran pê neke da ku baş bibe."



Tedawîkarê gelerî Elî Hacî Ehmed wiha qedand: "Ev karê ku ez dikim ji bo xizmeta civaka meye, ji bo min astengî dernakevin lê ji bo kesê nexweş derdikevin, ji ber ku ez gelek karan bihev re dikim, derfeta min nîne ku ez li mal rûnim lewma gelek kes berê xwe didin çand û hunerê cem min. Li her derê gel ber xwe didin cem min, hin kes hene li Ewropa ne û bi salan nexweşin tên gel min ez bi wan re dibim alîkar êşa wan sax dibe. Hêviya min ew e ku gel li kevneşopiya xwe vegere ji ber ku ev karekî mirovî ye û ji bo civakê ye."

## Gotina Dawî



### Hemû Çav li Îmraliyê ne!

Mihemed Seydi

Di nava agirê li herêma me de, Kurdan rola agirkujiyê girtiye ser milê xwe. Li Sûriyê ji bo agirê ku Daiş'ê pêxist û xeteriya komkujiyan, Kurdan xwe kir bend û pêşî li vî agirê ku Ter û hişk dabû ber xwe girt. Li bakur Kurdistanê jî dîsa dewlet ji bo ku agirê muhtemel ê li ser serê wî wê pêkeve û pêketiye, xwe davêje bextê Kurdan û dixwaze bi wan re li hev were. Ji ber wê ye ku di 21'ê Mijdara îsal de, piştî nîqaş di nava dewletê de dihat kirin ka ew ê çawa bi awayekî fermî serdana Îmralîlê bikin, biryara serdanê ji aliyê MHP û AK-Partiyê ve hat girtin. Li aliyê din jî formek li bajarê Dihokê yê başûrê Kurdistanê hat li darxistin û rayedarên bakur û Rojhilatê Sûriyê di sêrî de fermandarê QSD'ê Mezlum Ebdî û seroka Daireya Karên derve ya Rêveberiya Xweser Îlham Ehmed beşdar bûn ku li wir hin rayedarên Tirk ên weke Ehmed Dawud Oglo jî amade bûn. Dawud Oglo beriya demekê serdana Silêmaniyê jî kiribû û li wir bi serokê YNK'ê Bafil Telebanî re jî rûnişt û pesna siyaseta Mam Celal Telebanî jî dabû. Di demekê de ku beriya wê dewleta Tirk heta gefa kuştina Bafil xwaribûn û digotin ku ew divê xwe dûrî PKK'ê bixe. Li gorî ku raportajên ku Dawud Oglo dide, ew qale hevdîtinên xwe yên baş bi serokê MHP'ê Dewlet Bahçelî re di van demên dawî de dike. Yanî, tê fêmkirin ku ev tevger û serdanên wî bi ferman û agahdariya Bahçelî pêk tên. Ji ber di destpêkirina pêvajoya ku bi banga Rêber Ocalan a di Sibatê de, Bahçelî zilamê dewletê yê herî serekeye. Ji wê demê ve, her çiqasî banga serdana Îmraliyê tê kirin, lê gelek aliyên nava Tirkiyê û di sêrî de CHP'ê naxwazin beşdarî vê serdanê bibin ku Ocalan muxatebê pêvajoyê ye. Lê îro bi biryara piraniya dengên Komisyonê, serdana îmraliyê bû biryar.

Li aliyê din, helwesta Bahçelî hemû alî mejbûr kirin ku biryara serdana Îmraliyê bi eşkereyî qebûl bikin. ew jî ji ber banga Serokê MHP'ê ya ku gotî: ger hûn neçin, ez ê tevî çend hevalên xwe herin Îmraliyê yê.

Di rasiyê de ya ku mirov ji vê îsrara Bahçelî fêm dike ew e ku haya wî ji hin planên mezin ên guhertinên li herêmê heye, di demekê de yên li dora wî fêm nakin û tênaghêjin ew ê çi bibe û çi biqewime. Dibe ku talîzokeke mezin dîsa herêmê bide berxwe û navenda wê jî Îrane be û ji wir jî derbasî Ezerbîcan û Tirkiyê bibe, lê yên ku pêvajoya danûstandina bi Ocalan re asteng dikin, nizanin wê çi biqewime. Lê Bahçelî dixwaze berî ku ev bagera hertiştî bide ber xwe, bi Rêber Ocalan re bighêje encamekê da xwe li ser lingan bigrin. Ji bo wan hebûn û nebûna wan di xeteriyê de ye û lewma ewqasî lez dikine, lê ji bo Kurdan aştî û çareserî ya herî girînge da agirê li herêmê vemre û dawî li şerên ku civak pûç û zuha kiriye were. Her çi agir pêkeve jî, agirkuj Kurdin û wê Kurd bin. Ji ber wê ye niha her kes xwe davêje bextê Kurdan û dewlet li dora Îmraliyê digere. Rêber Ocalan e yê ku li qadê bi fîzîkî ne hazir e û ji pêş kamîreyan wendaye, lê ew e ku hemû aliyan tîne gel hevdû. Forma li Dihokê jî encama siyaseta ji Îmraliyê ye. Pêvajo wiha dimeşe û hemû çav dîsa li daxuyaniyên ji Rêber Ocalan in ka wê çi ji komosyona ku serdana wî bike re bêje.

### Sudoku:Pirs 66

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | | 4 | 1 |
| | 4 | 2 | 6 | | | | 3 | 5 |
| | | | | 2 | 4 | | 7 | |
| | | 7 | | | | | | 6 |
| | 9 | 3 | 2 | | 6 | 4 | 1 | |
| 2 | | | | | | 8 | | |
| | 8 | | 4 | 3 | | | | |
| 9 | 2 | | | | 1 | 7 | 8 | |
| 3 | 1 | | | | | | | |

### Sudoku: Bersiv 65

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 3 | 6 | 9 | 5 | 2 | 8 | 7 | 1 |
| 8 | 5 | 9 | 7 | 1 | 6 | 2 | 4 | 3 |
| 2 | 7 | 1 | 4 | 8 | 3 | 9 | 5 | 6 |
| 1 | 6 | 7 | 3 | 2 | 8 | 5 | 9 | 4 |
| 9 | 4 | 5 | 1 | 6 | 7 | 3 | 2 | 8 |
| 3 | 2 | 8 | 5 | 4 | 9 | 6 | 1 | 7 |
| 7 | 9 | 2 | 6 | 3 | 1 | 4 | 8 | 5 |
| 5 | 8 | 3 | 2 | 7 | 4 | 1 | 6 | 9 |
| 6 | 1 | 4 | 8 | 9 | 5 | 7 | 3 | 2 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Di dema mijê de refa xwe bernade:**
- Wefadar e; di tengiyê de dev ji hevalê xwe bernade.

**Di dilê wî de tiştek nîne:**
- Mirovekî paqij e; dilpak e.

**Ez ne dîwarê tehtê duduyan im:**
- Ez te naxapînim; ji bo ku dilê te xweş bikim ez derewan nakim; ez rast dibêjim.

**Li rûyê wî da:**
- Bi awayekî eşkere jê re got; di rûyê wî de jê re **got**.

**Li ser xwêya xwe maye:**
Şaş nebûye, rê bernedaye; durist e.

**Mar dibêje; min dikujî bi dijminatî, min çal bike bi dostî:**
- Dijminatiyê bike lê ji exlaq û nirxên mirovayiyê dûr nekeve.

**Nanê xwe helal kir:**
- Dema yek debara xwe li cem hina dike lê ew jî baş dixebite hingê tê gotin.

**Nanê xwe genimî kir:**
- Nanê xwe helal kir; karekî baş kir.

**Nanê xwe tewaş kir:**
- Wê karê kirina wî bide wî; ji bo xwe baş kiriye:

**Şûr kalanê xwe nabire:**
- Kesê ji aliyê yekî ve were parastin zererê nadiyê.

**Tişta di dilê wî de li ser zimanê wî ye:**
- Rastgo ye; tiştekî venaşêre.

**Xal û xwarzî li cem min nînin:**
-Ez di rûyê mirovan de her tiştî rastûrast dibêjim; ez kêmayiyên hevalê xwe deqûdeq jê re dibêjim.

**Xwêdana xwe vedixwe ava wî venaxwe:**
- Jê re pir durist e; pê ve girêdayî ye; xiyanetê lê nake.

**Ya di dilê wî de li ser ziman e:**
- Tişta di dilê xwe de dibêje.

**LI SER KESÊ BÊNANÛXWÊ Û KESÊ QENCIYÊ JI BÎR DIKE**

**Ava binê cêr e:**
- Kesên qenciya mirovan ji bîr dikin ji bo wan tê gotin.

**Bavê xwe nas nake:**
- Bênanûxwê ye; bêwefa ye; nebaş e; hevalê xwe, dostê xwe zû ji bîr dike; bêbext e.

**Bêserûçav e:**
- Ji qenciyê fêm nake; qenciyê zû ji bîr dike; bênanûxwê ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Ayşe Acar: Em her dem li hember pêvajoyê erênî ne



Parlementera berê ya Batmanê Ayşe Acar da zanîn ku di rêveçûna xebatên komîsyonê de Tirkiyê bingehên hiqûqî û siyasî ava nekiriye û got,"Em bi erênî nêzî pêvajoyê dibin, herwiha hemû aliyên Kurdî ji bo çareseriyê û serxistina pêvajoyê zimanê xwe saz dikin."**R-5**

## Bendavên Tirkiyê; siyasetek ji bo meşandina şerê avê



Dewleta Tirk da ku şerê avê wekî beşekî ji siyaseta xwe ya qirêj li dijî Rojavayê Kurdistanê bimeşîne, ji salên 60'î heya roja îro nêzî 20 bendavî li ser çemên Firat û Diclê daye avakirin...**R-4**

## Çîroka 30 sal ji girtin û berxwedanê



Di dîroka mirovan de tu kes nikarîbû bi ruhekî geş berxwedan û têkoşînê bi salan di girtîgehê de bijî, lê Baz û hevalên xwe ne wekî tu kesî bûn, ji ber ku xwedî fikir û armanc bûn, ne dijmin û ne jî dewletên cîhanê karîbûn wan bandor bikin da ku teslîm bibin, Baz fikir û armanca xwe ji teslîmiyetê mezintir didît.**R-6**

## Ji çiraxên hunera Kurdî



Hunermenda Kurd Narîn Feqe ne tenê dengek ku li welatên xerîbiyê stranên Kurdî dibêje, lê ew bûye parêzvana bîra çandî û balyoza nasnameya Kurdî li welatên xurbetê yên dûr. Wê barê ziman da li ser milên xwe, mîrata gelêrî ya Kurdî bi hemû çîrokên wê, melodî û metelokan ve hembêz kir, pêşî li ber windabûn û helandinê girt...**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1327 23-Mijdar-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# DAWÎBÛNA TUNDIYA LI SER JINÊ RÊYA AVAKIRINA CIVAKEKE DEMOKRATÎK E

Li cîhanê tundiya li ser jinan di rêjeyeke bilind de pêk tê, ev tundî bandoreke neyînî li tevahî civakê dike. Tevî ku li dijî tundiyê zagon û hevpeymanên navdewletî hene jî, lê heta niha wan rê li pêşiya tundiyê negirtine. Di vê çarçoveyê de li deverên hikumeta veguhêza ya Sûriyê û herêmên di bin dagirkeriya Tirk û çeteyên wê de, tundî di asteke herî jor de ye.**R-2**



## Ji destpêka salê û heta niha zêdeyê 8 hezar kes li Sûriyê hatine kuştin

Piştî ketina rêjîma Baas û bi hatina hikumeta veguhêz rêjeya kuştin, revandin û sûcên dijmirovî gihişt asteke xeternak, herwiha li ser destê çekdarên girêdayî hikumeta veguhêz bi dehan komkujî pêk hatin. Ji destpêka sala 2025'an ve û heta niha li Sûriyê zêdeyî 8 hezar kes hatine kuştin.**R-3**



JINWAR
İsyan Karadeniz R-2



Du Darên Qereçoxê û Bîranîna Civakekê
Sînan Cûdî R-4



Tundûtujiya dijî jinê
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



Sînema û bîr
Remezan Olçen R-7

# Dawîbûna tundiya li ser jinê rêya ber bi avakirina civakê ye

Li cîhanê tundiya li ser jinan di rêjeyeke bilind de pêk tê, ev tundî bandoreke neyînî li tevahî civakê dike. Tevî ku li dijî tundiyê zagon û hevpeymanên navdewletî hene, lê wan rê li pêşiya tundiyê negirtine. Di vê çarçoveyê de li deverên HTŞ'ê û herêmên di bin dagirkeriya Tirk û çeteyên wê de, tundî di asteke herî jor de ye.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Li cîhanê her dem bi şêwazên cuda tundî pêk tê. Jin bi tundiyê re rû bi rû dimînin. Li dijî tundiyê zagon û hevpeymanên navdewletî hene, lê heta niha jî rêjeyên derkevin diyar dikin ku zagonên heyî pêşî li kêmkirina tundiyê negirtine. Ji ber ku di salên dawî de tundiya li hemberî jinê bi rêbazên cur bi cur yên weke, di temenê zarokatiyê de zewicandin, revandin, bi razaya malbatê kirina bazirganiya jinê, lêdan, kuştin û hwd… pêk tê, zêde bûne. Ev pirsgirêka ku tu sînoran nas nake li cîhanê tevahî her ku diçe kûr dibe û wekê birînekê hebûna xwe didomîne. Tundiya li hemberî jinê binpêkirina mafan e.




### Di nava 20 salên bihurî de 840 mîlyon jin rastî tundiyê hatine

Rapora ku li ser denayên berfireh hatine amade kirin, nîşan dide ku tevî hewldanên siyasî û civakî yên di 20 salên bihurî de, pêşveçûn çênebûye. Li gorî raporê li seranserê cîhanê 840 mîlyon jin, di jiyana xwe de rastî tundiya fîzîkî û zayendî hatine. WHO'yê destnîşan dike ku ev rêje bêyî ku herêm û dahat bê cudakirin, dişibihe hev. Di heman demê de li gorî daneyên berfireh ên ku îsal cara yekem hatine weşandin, 263 mîlyon jin ji 15 saliya xwe ve ji hêla kesên nehevjîn ve rastî tundiya zayendî hatine. Di 12 mehên bihurî de 316 mîlyon jin jî rastî tundiya hevjînê xwe hatine.

### Tundiya li dijî jinan tenê ji sedî 0.2 kêm bûye

Li gorî ku WHO radigihîne di nav 20 salan de tundiya li dijî jinan tenê ji sedî 0.2 kêm bûye. Herwiha rapor, diyar dike ku bi taybetî jinên ciwan ên di navbera 15-24 salî de herî zêde di xetereyê de ne. WHO destnîşan dike ku tundî bandorek giran li ser pêvajoya mezinbûna jinên ciwan û avakirina jiyana wan dike.

### Tundiya li ser jinekê bandorê li ser civakê hemû dike

Tundî tevgereke êrişkar e ku li hemberî hemû beşên civakê jin, zarok û mêran tê kirin. Ev bûyer bi taybetî li hemberî jinan tê meşandin ku li gorî bîlançoyan ji her 100 jinan, 3 jin rastî tundiyê tên. Bêguman ev rêjeyeke ne normal e ku ewqas jin rû bi rûyê tundiyê werin. Neteweyên Yekbûyî ji bo vê mijarê roja 25'ê Mijdarê weke "Roja Têkoşîna Li Hemberî Tundiyê" ragihand ku her sal di vê demê de balê dikşîne ser bûyerên tundiyê. Tundiya ku pêk tê ne tenê bandorê li ser kesayeta jinan dike, berovajî wê bandorê li ser zarok û hemû malbatê dike. Civak bi ferdan ava dibe, heger ev zarok jî di bin şert û mercên tundiyê de mezin bibin, dê bibe sedem ku civakek hilweşiyayî ava bibe.

### Tundî di nava xwe de gelek cureyan digre

Gelek cureyên tundiyê hene ku mirov dikare wan wiha vebêje; Tundiya fîzîkî ku di asta yekem de bedena jinan ziyanê jê dibîne, tê îşkencekirin û lêdanê dixwe. Jin bi dest, ling û amûran, lêdanê dixwin ku di encamê de gelek nexweşî jî xwe didin der. Ev yek jî dibe sedem ku gelek jin dawî li jiyana xwe bînin. Lewra dema ku jin rû bi rûyê vê rêbazê tundiyê werin divê jiyana xwe bi kesê tunekar re berdewam nekin û dozan vekin.

Herwiha tundiya di warê gotin û axaftinan de heye. Gelek mêr hene ku bi gotinan heqaret li jinan dikin, biçûk û bê nirx dihêlin ku ev yek jî xwe dispêre tundiyê. Dema ev herdu cureyên tundiyê tên gel hev, dibin tundiya derûnî. Dema jin lêdanê dixwin, tên îşkencekirin, hem ji aliyê fizîkî ve zirarê dibînin, hem jî ji aliyê derûnî ve tên parçekirin ku di encamê de jin hêz, bawerî, moral û vîna xwe ji dest didin. Li kêlek van jî tundiya aborî heye, dema ku jin ji aliyê aborî ve serbixwe nebin, dibe sedem ku jin neçarî mêran bimînin. Dema jin jî neçar dimînin, mêr ji bo xwe rewa dibînin ku zordarî û tundiyê li hemberî wan bi kar bînin. Di encamê de ji ber ku bingeha civakê jin in, tundî bandorê li ser tevahî civakê dike. Li Sûriyê jî, di dema rêjîma Baas û piştî hilweşandina wê ku bi hatina HTŞ'ê tundiya li ser jinê bi rengekî berbiçav li ser jinê pêk tê û rastî bêdengiyê tê.

### Li herêmên dagirkirî Tundiya li hemberî jinan di asteke bilind de ye

Di vê çarçoveyê de bajarên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ku di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê de ne weke Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî û Minbicê, di nava salekê de bi sedan sûcên ji kuştin, destdirêjî, îşkence û revandina jinan lê qewimîn e. Tundiya li herêmên dagirkirî ya li hemberî jinan di asteke herî jor de ye. Lê ji ber li herêmên dagirkirî derfeta lêkolîneke bi tendurist tune ye, hejmarên rast jî tam nayên zanîn. Lewma li gorî agahiyên ku saziyên têkoşîna li dijî tundiyê parve dikin, ev yek tê piştrastkirin.

### Li herêmên dagirkirî 25 jin hatine qetilkirin

Li gorî daneyên ku Navenda Lêkolîn û Parastina Mafên Jin belge kirine, ji Mijdara 2024'an heta 1'ê Mijdara 2025'an li Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî 25 jin hatine qetilkirin, 37 jin hatine birîndarkirin û 23 jin jî hatine revandin. Li van herêman jin rastî her cureyê tundiyê tên. Taybet li Efrînê hêjmara jinên ku tên revandin her ku diçe zêde dibe. Jinên tên girtin û di girtîgehan de rastî îşkenceyên herî tund tên. Herwiha li Serêkaniyê û Girê Spî jin tên revandin û çarenûsa wan nayê zanîn. Di heman demê de çekdarên li Efrînê bi darê zorê baweriya jinên Êzidî didin guhertin, hîcabê li wan dikin, hem jî zorê lê dikin ku navên xwe biguherin û wan bi zorê bi xwe re dizewicînin. Li herêmên dagirkirî ji ber binpêkirinên ku li dijî jinan tê kirin, bi gelek jinan re nexweşiya derûnî çêbûne û ji ber wê jî xwekuştin zêde dibin.

### Cezayê revandina jinan ne diyar in

Li gorî agahiyên ku Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, ji Mijdara 2024'an heta 1'ê Mijdara 2025'an belge kirine, li Efrînê 14 jin hatine qetilkirin, 22 birîndar bûne ji ber tundiyê û 30 jî hatine revandin, hin ji wan jî cezayên revandina wan ne diyar e.

### Rêjeya jinên ku bi balafirên dewleta Tirk hatine kuştin

Li gorî agahiyên Rêxistina Mafê Mirovan a Sûriyê jî, ji Çileya 2025'an heta Îlona 2025'an li Cizîrê bi êrişên balafira bê mirov 2 jin hatine qetilkirin, li kantona Firatê bi balafira bê mirov 2 jin û bi topbaranê jinek hatine qetilkirin. Minbicê bi balafira bê mirov, êrişeke çekdarî û teqînan 19 jin hatine kuştin. Li Efrînê bi êrişên çekdarî, xwekuştin 7 jin hatine qetilkirin. Herwiha li Cizîrê 4 jin bi topbaranê, li Firatê 3 jin bi bombebarana balafira bê mirov û topbaranê, li Minbicê 36 jin bi rêya balafira bê mirov û teqînan, li Efrînê 3 jin bi êrişên çekdarî birîndar bûne. Êriş, topbaran û bombebarana bi balafiran ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve ne.
Ji Mijdara 2024'an ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê ve, li Efrînê 2 jin bi êrişeke çekdarî birîndar bûne, li Minbicê bi topbaranê 3 jin hatine qetilkirin û 2 jî birîndar bûne, bi êrişeke çekdarî 2 jin hatine kuştin, bi bombebarana balafira bê mirov jinek hatiye qetilkirin û jinek hatiye revandin. Li Kobanê 2 jin bi topbaranê û 2 jinên din bi balafira bê mirov hatine qetilkirin. Li Eyn Îsayê bi bombebarana balafira bê mirov 2 jin hatine qetilkirin.

**Di heman demê de bîlançoya Rêxistina Sara li dijî tundiya li ser jinê li Sûriyê ya sala 2024'an wiha ye:**

Kuştin: 12
Xwekuştin:14
Rewşên Berdanê: 12
Pirjinî: 54
Jinên ku ji mal û hevjînên xwe reviyane: 61
Xapandina hevjînî: 2
Şantaja Elktironî: 4
Gefên bikuştinê: 4
Tecawizkirin: 2
Tewanên Namûsê: 1
Pevçûnên hevjînî: 12
Şewitandin: 4
Hîyar: 1
Kerxane: 3
Hewldanên xwekuştinê: 52
Lêdan: 115
Zewaca temenê biçûk: 41
Destdirêjî: 6
Rewşên piskolojîk: 89

**Bîlançoya Rêxistina Sara ya sala 2025'an a ji yekê Çileyê heya 1'ê Mijdara 2025'an jî wiha ye:**

Kuştin: 22
Hewldanên kuştinê: 7
Gefên bikuştinê: 3
Lêdan: 57
Hewldanên xwekuştinê: 48
Tecawizkirin: 3
Gef: 12
Şantaja elektironîk: 6
Revandin: 49
Tewanên Namûsê: 1
Pirjinî: 7
Rewşên piskolojîk: 10

**Bîlançoya Mala Jin a Qamişlo ya 10 mehan jî wiha ye:**

Pevçûnên hevjînî: 800, yên ku ji wan hatine çareserkirin (602), ên benda çareseriyê ne (43), ên ku di dadgehên de ne (152) ne.
Pêvçûnên malbatê: 132, yên ku hatine çareserkirin (121), ên benda çareseriyê ne 8 in, ên di dadgehê de ne (3).
Pevçûnên giştî: 137, yên ku hatine çareserkirin (123) ne, ên benda çareseriyê (2), ên di dadgehê de ne (9).
Pirjinî: 51, yên hatine çareserkirin (13), ên benda çareseriyê ne (4), ên di dadgehê de ne (30).
Zewaca temenê biçûk: 34, yên ku hatine çareserkirin (24), ên benda çareseriyê ne (2), ên di dadgehê de ne (8).
Lêdan: 32, yên ku hatine çareserkirin (13), ên di dadgehê de ne (12).
Xapandina hevjînî: 7, yên ku hatine çareserkirin (5) û yên di dadgehê de ne (2).
Revandin: 78, yên ku hatine çareserkirin (65), ên benda çareseriyê ne (1).

### Divê çareserî ji nava malbatê bê destpêkirin

Mirov nikare pirsgirêk ango hişmendiya ku temenê wê ewqas sal e di demeke kin de ji kokê ve rake, lê herî kêm divê ku ev yek bê sivikirin û çareseriyên alternatîf pêşkêş bikin. Ji ber vê em dikarin hinek rêbazên çareseriyê bibînin ku divê pêşî çareserî ji nava malbatê dest pê bike. Dema zarok bi rengekî tendirust werin perwerdekirin û mezinkirin, herwiha rêbazên danûstandina rast werin fêrkirin dê zarok jî bi heman hişmendiyê mezin bibin. Pişt re dibistan û materyalên xwendinê rol dilîzin divê zarokên di pêvajoyên dibistanan de perwerdeyê dibînin, bi taybetî materyalên ku hezkirin û naskirina zayenda jin didin naskirin, bi kar bînin. Hem jî ji bo ku pêşî li tundî û newekheviya li hemberî jinê bê girtin, divê hemû tedbîr bên girtin û asta têkoşînê ji vê zetir bibe.

**Akademiya Jîneolojî**

**JINWAR**

İsyan Karadeniz

Jinwar, projeya hêviya ku ji bo şêwaza jiyana demokratîk a komûnan û pêwendiyên bihevrebûnê bi keda xwe gav bi gav honandanê jiyanî dibe. Jinwar a ku bingeha wê di 10`ê Adara 2017'an de hat danîn di 25`ê Mijdara 2018'an de hat vekirin. Di Roja Têkoşîna li Hemberî Şîdeta li ser Jinan de vekirina wê ji bo hişmendiya desthilatdariya mêr a serdest bersivek e. Di gundê jinan de 31 malên ji birîketan, Navenda Tenduristiyê ya Şîfajin, dikan, firin, akademî, dibistan, qada lîstoka zarokan, mala zarokan, mala ciwanan, hewz, qada jiyana ajalan, xwaringeha hevbeş û qadên çandiniyê yên ji bo pêdiviyên jiyanê hene. Ji bo ku ev proje bi nêrîneke hevbeş a paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinan bikeve meriyetê baldarî li ser cih û warê wê çêbûye. Weke mînak şeklê xaniyan, mezinahiya wan, amûrên bên bikaranîn, hebûna qadek şînahiyê, qada jiyana hevbeş, cihê jiyana sewalan û weke din. Her tişt bi kitekitên wê li ser hatiye ponijîn û bi wî şêweyî pratîkê. Jinwar tenê weke gundek ku hêza xwe ji şoreşa jinan digire têr nîn e.
Ji ber wê jî divê zêdetir wate lê bê barkirin. Ew warê ku şoreşa jinan lê civakî dibe û gavên jiyana azad lê tên avêtin e. Şoreşek, çiqas hîmên wê yên bingehîn bihêz bin jî dema ku civakî nebe û nekeve pratîkê wê wateya xwe winda bike. Darek çiqasî kokên xwe berde kûrahiyê, ewqas gewdeyê wê li hemberî zoriyan berxwedêr dibe. Her ku civakîbûn bi pêşengiya jinan bi pêş dikeve pergala deshilatdariya mêr a serdest jî ewqas bi paş dikeve. Bi hêza avakirina têkoşîna jinan wê pergala alternatîf ava bibe. Ji ber wê jî divê lingê bîrdoziya azad ê modernîteya demokratîk ê civakî zêdetir bê kûrkirin û berfirehkirin.
Di giştî çar aliyên Kurdistanê bi taybetî jî li Rojava rêgezên jiyanê yên bi pêşengiya jinan ji kûrahiya dîrokê diherike û ruhê wê di Jinwarê de gengaz e ku bê dîtin. Şopên çand û jiyana dayika xwedawend a di pêvajoya civaka xwezayî de hem di lêkolînên arkolojîk de hem jî di şopên jiyana civaka li vê derê dijî de heta roja me hatine. Bi taybetî jî di nirxên civakî yên jinên Kurd ku hê şaristaniya kapîtalîst xwe negihîştandiyê gengaz e bê dîtin. Weke şoreşa jinan li nirxên jiyana komunal ên azad xwedî derketin, di roniya paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinan de nêrîna li pêşketinên civakîbûnê wateyek mezin digre nava xwe. Ji ber wê jî Jinwar di warê ceribandinê de weke laboratuwarê ye. Nêrîna Rêber Apo ya "Çima bajarê jinan û qadên azad ên jinan nebin" ji bo avabûna vê projeyê hem bû ronahiyek hem jî wateyeke mezin lê bar kir. Cihê jinên li hemberî zorê rabûne, zilma zilam dîtine, ji bêmafiyê bêzar bûne, dixwazin bibin ayîdê xwe û yên naxwazin bibin amura çîrokên çêkirî yên mêra ne. Di vî warî de li hemberî hemû cure rêbazên mêtîngerî û tehakuma li ser civakan, jinan û xwezayê tê meşandin, şideta li ser jinê, mêtîngeriya kedê, yên mafê wan tê gasp kirin, li hember sepandinên zayendperestî, nijadperestî, olperestî û zanistperestiyê vekirina qadên wiha ji bo têkoşîna jinan giringe. Jinên li Jinwarê dijîn yên her tim rêgezên jiyana jinê bingeh digirin û bi xwe hewil didin çavkaniyên xwe biafirînin li hemberî hişmendiya mêrê deshilatdar serî hildide bi gavên ji xwe bawer ên jiyana komunê dewam dike.
Virgina Wolf gotibû 'Divê odeyek aidê me hebe'… Jinwar a di nava Şoreşa Jinê ya Rojava de avabûyî bi ceribandinên xwe yên 8 salan ji bo jinan danehevek mezin kom kiriye.




# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yusef**

Hunermend Narîn Feqe, dengê jina Kurd di rûyê jibîrkirinê de li sirgûnê. Hunermend û stranbêjên jin ên kurd di welatên xurbetê wek bingeha sereke ne, di parastina bîra kurdî û di berxwedana dijî jêbirina nasname û zimanê de, bi saya israrakirina wan ji xwendina stranên kurdî re , zindîkirina stranên kevneşopî bi rûhê hemdemî, û têkildana hunerê bi berxwedana jinan û neteweyî re, dengên wan vediguhêzin tayên zêrîn ku pê nexşeya nû ya girêdayînê vehûnin.
Ew îro ne tenê stranên xwe pêşkêş dikin, lê ew bîrdanka gelê xwe diafirînin , Xerîbî ne asteng e, lê ew platformek e, di her dengê jinê de ku bi kurdî stranan dibêje, welat ji nû ve tê vejînkirin ,ne wek erdingerîyek, lê wek nasnameyek zindî, ku lidijî mirinê serî hildidê .
Ji ber dengên wan, dijminên Kurdan dilerizin, herwiha helbest jî , ji ber ku ev jin ne tenê stranbêj in ... ew li dijî wendakirinê berxwedidin, ew di parastina mîrasa çandî ya Kurdî, nasnameya neteweyî û zimanê dayikê de rolek girîng dilîzin, nexasim dibin şertên siyasî û civakî yên ku herêmên Kurdan têre derbas dibin di warên koçberiyê û xerîbbûnê de.
Rola wan di derveyî welat, sînorên hunerê derbas dike û digihêje kiryara çandî, neteweyî û siyasî, ew carna berxwedanek nermîn , serhêl , bê deng bi kartînin û carna jê bi dengekî bilind li dijî wendakirin û jibîrkirinê pêş dixin.
Di her straneka ku ew dibêjin, qîblenameyek heye ku ber bi Kurdistanê ve destnîşan dike, û bangeka hêvîyê heye , tekez dike ku hebûna kurdî - ku li sirgûnê jî be - hîn jî zindî dimîne, bi zimanê xwe diaxive, û ji bo azadiya xwe distirîne.

Hunermenda kurd Narîn Feqe yek ji hunermendên jinên navdar ên kurd tê hesibandin ku peywirê parastina zimanê kurdî, stranbêjiya mîrateya çandî, û têgihiştina wateyên nasnameya neteweyî ya Kurd di wijdana girseyî de pêk tîne.
Hunermenda kurdî Narîn Feqe di 01.11.1980'an de li bajarê Dîrêk , ji dayîk û bavek kurd (Adil û Cînan) hatiye dinya yê, ew bajarê ku dikeve di dilê Kurdistana Rojava de , ku her dem bûye û hîn jî minareyek ji bo çand û hunerê , wargehek ji bo raman û zanistê, penahek ji bo nivîskar û stranbêjan û mihravek ji bo wêje û helbestê.

Di nav kolanên wê yên kevnare û zeviyên wê keskîn de ,û di navbera stranên jinan û awazên mêran de , hişmendiya wê ya yekem hat avakirin û bîranîna wê despêkir bi bênxweşiya xakê û dengê welat ve dema ku ew hîn di dehsaliya zarokatiya xwe de bû berî ku jê dûr bikeve , ew ji binemala malbatek neteweyî û hunerî ya kevnar e, û torîna stranbêjê mezin Ehmed Feqe Hesen e, ku yek ji pêşengên stranbêjiyê kevneşopî ya kurdî ye, û keça hunermendê navdar Adil Feqe ye, ku ew ne tenê bav bû ji bo wê, lê her weha mamoste û dengê sereke



bû jê re.
Narîn ji wî peyvên stranbêjiyê kurdî û bedewiyên wê wergirtin , ji dibistana wî ya mûzîkî ew fêrî bingehên stranbêjiyê kurdî bûye, wê ji mîrasa bav û malbata xwe, giyanê hunera rastîn û bîhnxweşiya nasnameyê vexwarte û bi şêwazê xwe yê taybet rengekî hunerî vehûnand û hevbexşiyek kir di navbera reseniyê û nûvekirinê û di navbera kultûr û nûjenî yê de , wê bi zimanê kurdî stranên herî bedew digotin, ku di dengê xwe de wê taybetmendiyên çiya, dengvedanên geliya
û êşa sirgûnê hildigirtin.
Narîn li ser destê bavê xwe fêrî awazên ku xwe berdidin di wijdana gelê kurd de ji mêj ve, wê ew stran bi rastî û bedewî strandin, karî di navbera şêwaza klasik û kevneşopî de û di navbera hestên xerîbî yê de hevrêzîyekî çêke, û ji dengê xwe pirek afirand di navbera Dêrik û Stokholmê de, û di navbera welat û sirgûnê de.
Narîn di himbêza malbata kurdî ya resen de mezin bû, malbatek ku girêdayî bi evîna axê, ziman û mirasê ve , ku huner ji bo wan bû penahek , û stran bû belgeyeka xweparêzî û nasname yê , ji zarokatiya xwe ve dît ku stran ne tenê derbirîna hestan dike, lê ew amûreke tekoşînê ye û peyamek a neteweyî ye ku bîra gel diparêze , êş û hêviyan dinivîsîne,
Di destpêka zarokatiyê xwe de, dema ku ew hîn dehsalî bû, malbata wê neçar ma ku koçî welatê Swêdê bibe, wê di himbêza xurbetê de jiyan kir, bi zimanek biyanî û çandek cûda hate dorpêç kirin, ku di dilê xwe de hilgirtibû nîşanên zaroktiya Kurdî û bîhnxweşiya axa ku di bîra wê de zuwa nabe mayî , êdî li wir dest pê dike demsalên zarokatiya wê di nav xerîbî yê de, dûr ji axa welat û peneya malbatê.
Narîn ne zimanê xwe , ne jî stranên bavê xwe û ne jî germahiya bajarê xwe ji bîr nekir, herçiqas ku welat bi erdnîgarîya xwe jê dûr be jî, lê ew di hest û wejdana wê de dimîne, di dengê wê de diherike her cara ku ew stranan dibêje.
Tevî dûrbûna wê , rayên wê ji axa Kurdistanê qut nebûn, ew li ser soza netewperweriya xwe maye , zimanê xwe parastiye , serbilinde bi nasnameya xwe ya çandî, bi xwe re bênxweşiya Dêrikê , vedenga stranên bav û kalan hildigire , ew bi koka xwe girêdayî maye , dûrbûnê nekarî zimanê dayîkê ji bîra wê bibe û ne jê bangên jiyana rojane li sirgûnê karî di ruhê wê de pêta xweparêziyê vemirîne, terzî vê , xerîbiya ji welat bû sedema ku bi hêvîya zêdetir hunera xwe bike di bin xizmeta zimanê kurdî û vejînkirina mîrateya wê ya stranbêjiyê.
Wê di sala 2000'an de dest bi kariyera xwe ya hunerî kir piştî ku xelata baştirîn ya Dengê Ciwanan wergirt di pêşangeha stranbêjiyê ,ya li Stockholmê de, bi beşdariya Komîteya Hilbijartinê ku di nav de muzîkvan Dilşad Saîd û hunermend Şivan Perwer jî hebûn, Ji hingê ve, wê gelek stran pêşkêş kirine ku şêwazê romantîk, neteweyî û folklorê tevlihev dike.
Karên wê yên yekemîn stranek hevbeş bû bi bavê xwe re (Dîlberê)
ku piştdarîk da navdarbûna wê, piştî wê jî strana (Nalînek tê guhê min) ya hunermend Mihemed Şêxo ku wê bi şêwazê xwe yê taybet pêşkêş kir, bû destpêka derçûn û navdariya wê ya hunerî .
Di bîst salên borî de, Narîn sê albûm weşand û bi qasî 40 stran û 13 klîpa vîdyoyî pêşkêş kir, Serketina wê bi taybetî vedigerê saya bavê wê , ku her dem alîkarî û piştgiriya wê dikir, di hilbijartina û pêşkêşkirina stranan de .
Ji stranên wê yên herî navdar:
1- Peyîza Xewnan .
2- Zimanê Dayîkê .
3- Jin Jiyane .
4- Hêvî .
5- Çima Nayê .
6- Penaberî .
Narin Feqe zewiciye û dayîka du keça ye (Roniya û Helîn) , zêdetir ji 35 salane li Swêdê dijî, lê her dem girêdayî çand, ziman û doza xwe ya neteweyî ya kurdî ve maye, ji sala 2015'an ve, wê piraniya xebata xwe terxan kirin ji bo piştgiriya Rojava û gelê wê .
Narin Feqe ne tenê domandina hinêra bavê xwe ye , lê ew dengê nifşekî nû yê kurd e ku li derveyî welat hatiye dinyayê, dûrbûna welat nekarî wan ji reseniya wan dûrbêxe, lê hişmendiya wan zêdetir kir bi giringiya parastina ziman, çand û nasname yê ve, bi hunera xwe, wê pireka zindî ava kir di navbera bîranîna kurdî û rewşa hemdem de.
Narin di rêwîtiya xwe ya hunerî xwe de komkek stranên kurdî pêşkêş kir ku derbirîna êşên neteweyî, hestên xemgîniya derbideran, û nebeza gund û bajarên kurdî dikir,
Stranên wê ne tenê keyfxweşî bûn, lê ew şahidiyek zindî ya rola hunerê di parastina bîranîna kolektîf, ziman û nasnameya neteweyî de bûn , di her xuyangê de, wê piştrast dikir ku hunera Kurd ne tenê mîrateyek e, lê berpirsiyariyek û peyamek e.
Narîn her dem hevsengîyek dikir di navbera parastina mirasa resen a kurdî û nûvekirina hunerî de ya ku geşedana wê bandorek li muzîka navneteweyî dikir.
Stranên wê nêrînek kûrahiyî ya mîrateya çanda kurdî nîşan dide, bi tevlihevkirina teknîkên muzîkî yên nûjen, bû sedema ku dengê wê di nav revendên kurdî yên Ewropa û Kurdistanê de serkeftin û şanazî mezin bidest bixe.
Narîn hin bi hin veguhêziye dengê kurdî yê resen li welatên xurbetê , di helkeftên kurdî û Ewropî de, di festîvalan û di qadan de stranên kurdî ên herî bedew dibêje, bi zaravayên wê yên cuda , ku dengê jina Kurd ya ji bo azadiyê distirîne dest nîşan dike, û vedibêje çîrokên şewitandina gundan, dilên westiyayîn û dengê ku hîn jî di qêrînê ji dûr" em nayin jibîrkirin , heya ku stran zindî ye "
Karên wê pirek zindî diafirîne di navbera dema borî û îroyîn , di navbera gund û bajaran, di navbera nifşê ku li gund û çiyayên xwe jîyan kirin û zarokên kurd ên derbider ku li binyada xwe di stranan de digerin .
Narîn Feqe tê diyar kirin bi şêwazê stranbêjiya xwe ya taybet, ku hevrêzîyekî çêdike di navbera kovanê rastîn yê kurdî û henaseya nûjen a ku ji tecrûbeyên xwe yên li derveyî welat bi bandor bûyî ,ew stranên xwe bi baldarî hildibijêre û
hevbexşiyekî di navbera mirasa kevin a kurdî û mijarên hemdem de pêk tîne, ku despêdana
wijdana nifşê nû yê kurdên ku di sirgûnê belav in, dike , ew bi rewanekirina xwe rêzgirtinê ji zimanê kurdî re digire, gotinên wê bi zelalî û serbilindî têne gotin, mîna ku ew bîranînek girseyekî di xetereyê de zindî dike
Narîn ji bo şoreşgerên Kurdistanê û dîroka gelê Kurd , ji bo evîn û wendabûnê , ji bo jin û azadîyê jî stran gotine , û herwiha ji bo zarokatiya ku ji kokê hatî rakirin li sirgûnê û ji bo dapîran ku li ser peyaran li benda zarokan xwe dimînin, stran gotine, di dengê xwe de, wê kovanên nifşan, govenda welat, û domandina nasnameyê hilgirtiye, stranên wê ne tenê kexfxweşî ne , lê qîrîneka wijdanîne ku êşa netewe, hesreta ji bo welat, û dilsoziya ji xak û zimanê re vedibêje .
Hunermenda kurdî Narîn Feqe bi rastî û dilpakî bi zimanê dayikê xwe distirîne, bi hestên nazik û herî xweş stranên bedew dibêje , ew dizane ku çawa helbestên bi giyanek zindawe hilbijêre, û awazên ku dilê mirov bigirin û bîrdankê şiyar dikin hilbijêre , ew xwedan dengeke ku ji bo xweparêziyê zindiye , û gewriyeke ku nasnameya gelê xwe di her awaz û stranê de diparêze.
îro jî, Narîn Feqe afirîneriyê dike , distirîne , daye ser milê xwe peyamek çandî û neteweyî , ku zimanê kurdî ji wenda bûnê biparêze û bîranîna girseyekî ku sirgûnê hewl da ku veşêre, vegerîne, ew bi dengê xwe jiyananameya xwe dinivîse û tekez dike ku girêdan ne cihek e, lê wijdanek kûre, û dengek e ku xiyaneta bîranîna xwe nake.
Hunermenda kurd Narîn Feqe ne tenê dengek ku li welatên xerîbiyê stranên kurdî dibêje, lê ew bûye parêzvana bîra çandî û bayloza nasnameya kurdî li welatên xurbetê ên dûr.
Wê barê ziman da li ser milên xwe , wê mîrata gelêrî a kurdî bi hemû çîrokên wê, melodî û metelokan ve hembêz kir, pêşî li ber wendabûn û helandinê girt, di nav şewşeniya axa xerîbî û dûrxistinê de.
Dixwazim ji bo wê serkeftin, afirandin, û ronahiyekî zêdetir .



**Sînema û bîr**

Remezan Olçen

Sînema ji alav û amûreke pêşandiyê wêdetir barhilgir, hişhilgirê civak û koman e jî. Heta ev aliyê xwe hîn xurttir e. Îcar ji bo gelê Kurd ê ku bi dehê salan e ziman û çanda wî hatiye qedexekirin; sînema dinyayeke din e. Sînema ji bo Kurdan ji beşekî hunerê wêdetir rêya bidestxistina mafekî ye ku pê dikare xwe bi zimanê xwe, bi cil û bergê xwe, bi xwezaya xwe bibêje. Bi rêya sînameyê em dikarin çîrokên xwe bi xwe bibêjin. Dengê mey ê winda bi rêya wê alava bi sêhr û efsûn li her derê cîhanê belav dibe. Sînor, qedexe pûç dibin.
Sînemaya Kurdî bîr û hafizaya gelê me jî çêdike, texrîbatan temîr dike. Lê ev ji bo fîlmên serketî, derhêner, senaryo, lîstikvan, deng û dîmenên serketî mimkûn e. Ev element lazim e ku hemû hev temam bikin. Dibe ku çîrok pir saxlem be lê yek ji kêmbûna elementan dike ku çîrok winda bibe. Hasilî gelek aliyên xwe hene. Lê em dibînin ku hunera Kurdî di vê beşê de jî berhemên xweşik û delal çêdikin.
Sînemaya me dibe dengê çîrokên me yên dengê wan hatibû birîn û jêkirin. Zimanê me bi ziman dibe. Têkoşîna me ya ji bo hebûn û azadiyê bi rêya sînemayê di zemîneke estetîk tê nîşandan. Nasnameya Kurdî, têkoşîna me êdî xwe nîşan dide. Bi rêya festîvalan li cîhanê jî Kurd bi dengê xwe, bi dîmenên xwe, bi çîrokên xwe dikarin bigerin û derdê xwe bibêjin. Ji van hemûyan zêdetir sînemaya Kurdî j ime re arşîveke bîr û hafizayê çêdike.
Em di sînemaya xwe de mekanên xwe, gund û bajarên xwe, mêrg û çiyayên xwe, mal û hêlîna xwe dibînin. Wan kuçeyên ku şûnpiyê zarokatî, ciwanî û yextiyariya emrekî ye zindî dibe, vedijî. Em li wan kuçeyan bi kamerayê re li zarokatiya xwe, li zimanê xwe, li têkoşîna xwe digerin û dibînin. Bi rêya sînemayê çêkirina arşîveke ji dîmenan tiştekê muhteşem e. Tedî dibêjin; tişta ku çav di kêliyê de dibîne, ziman bi salan nikare bibêje.
Em hêvî dikin û bawer dikin ku wê siberojan bi zêdetir festîvalan em ê hîn bêhtir pêşketina li sînemaya Kurdî bibînin. Heftiya çûyî li Qamişlo, vê dawiya heftiyê jî li Almanyayê li Hamburgê sînamegerên Kurd çîrokên me vegotin. Bila rêya wan vekirî be û tim serketî bin. Lê ji bo vê lazim e em jî weke civak li wan xwedî derkevin, desteka xwe kêm nekin, hîn bêhtir destekê bidin wan ku ew jî bi karê xwe vê bîr û hafizayê xurt bikin.

# Çîroka 30 sal ji girtin û berxwedanê

Di dîroka mirovan de tu kes nikarîbû bi ruhekî geş berxwedan û têkoşînê bi salan di girtîgehê de bijî, lê Baz û hevalên xwe ne wekî tu kesî bûn, ji ber ku xwedî fikir û armanc bûn, ne dijmin û ne jî dewletên cîhanê karîbûn wan bandor bikin da ku teslîm bibin, Baz fikir û armanca xwe ji teslîmiyetê mezintir didît.

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Baz Efrîn di sala 1972`an de li Efrînê di nava malbatekî welatparêz de ji dayik bûye, ji zaroktiya xwe ve naskirina wî ji Tevgera Azadiyê re hebû, di heman demê de bi jiyana xwe ya zaroktî bi Tevgera Azadiyê re derbas kir, ew xwedî meraq bû ku hîn zêdetir Tevgera azadiyê nas bike û xwe bi tevgerê re bike yek, ji ber vê yekê di Newroza 1988`an de pêşniyar hat kirin ku komek were avakirin, li ser vê bingehê Koma Engîzek hat avakirin ku ji 6 kesan pêk dihat, herwiha Baz jî yek ji van kesan bû û cihê xwe di komê de girt. Ew kom jî ya çand û hunerê bû, Baz Efrîn nêzî 3 sal û nîvan di kar û xwebatên komê de ma. Piştî 3 sal û nîvan Baz derbasî çalakiyên herêmê bû, bi tayebet jî yê bajarê Efrînê.

**Baz fikir û felsefeya Rêber Apo kir nexşeriya xwe**

Baz piştî çend salan xwest ku derbasî qada leşkerî bibe û xwesteka xwe pêk anî, êdî karê ku da meşandin di navbera Rojava û Bakûrê Kurdistanê bû. Her ku roj, meh û sal derbas dibûn, Baz ewqasî girêdana xwe bi Tevgera Azadiyê re xurt dikir, di heman demê de fikir û fesefeya Rêber Apo ji xwe re kir nexşerê.

**Di sala 1993`an de Baz bi awayekî fermî tevlî refên Tevgera Azadiyê bû**

Baz dema ku kar û xebatên leşkerî dida meşandin, rastî pir hevalên di tevgerê de dihat ku karîbûn li hev kom bibin, dema ew bi hevalên xwe re diciviya, gelek hevalên wî behsa komkujî, talankirin, koçberî, şewtandina gundên Kurdan dikirin, di heman demê de behsa zehniyeta faşîzamê dikirin ku çawa dewleta Tirk û hevkarên wê kiriyar û komkujî li hemberî gelê kurd dane meşandin.

Ji ber vê yekê ev nîqaş û bi taybet dema ku rastiya dijmin nas kir, Baz bandor bû, êdî biryar da ku ew ê bi tevlî bûn û sekna xwe ya xurt wê bibe bersiv. Lewma di sala 1993`an de Baz biryara xwe ya tevlîbûnê dide û bi awayekî fermî tevlî refên Tevgera Azadiyê dibe. Ev rê ji bo Baz bû mîna jiyaneke nû, di heman demê de bû armanc ku bi hemû hewledanên xwe bibe milîtanekî pêşeng ji Rêber Apo û gelê Kurd û Kurdistanê. Li vir Baz dest bi rêya tekoşîn û berxwedanê kir, bi hemû hewledan, heycan û moralê xwe ber bi rêya azadiyê re meşiye. Tişta ku rêya Baz Ronî û bi hêz kir ew bû dema bi Rêber



Apo re hevdîtin kir. Bi hevdîtina Rêber Apo re Baz hîs kir ku tîrêjên azadiyê di ruhê wî de zindî bû.

**Baz di encama kemîneke bêbext de hat girtin**

Baz destnîşan kir ku dema tevlî Tevgera Azadiyê bû, dîsa xebatên di navbera sînorê Rojava û Bakûrê Kurdistanê zêdetirî 2 salan da meşandin.

Baz û hin hevalên xwe her di navbera Rojava û Bakûrê Kurdistanê xebat didan meşandin, çûn û hatina wan zêde bû. Rojekî Rêber Apo wan erkdar kir ku dîsa derbasî Bakur bibin, Baz bi heycanekî mezin ket rê, ew bawer bûn ku ew ê erka xwe bi awayekî serkeftî derbas bikin, ji ber ku Baz û hevalên wî tecrûbeyên wan çêbûbûn. Lê baz nezanî bû ku neyar û bêbextan ji wan re kemîn dane çêkirin, dema ku Baz û hevalên xwe bi hêz û heycaneke pir bilind bi rê dikevin, dewleta Tirk a dagirker kemîn ji wan re danî bû, di encama vê kemîna bêbext de baz û hevahên xwe ketin çatşmê de, li vir baz nema li pêşiya xwe didît, tenê dizanî ku hin hevalên wê hatin şehîd xistin, di heman demê de hin heval belav bûn û Baz jî di roja 3`yan de ji aliyên leşkerên dagirkeriya Tirk ve hat girtin.

Ji bo kêliya girtinê Baz ji Rojnameya me re got: “Ez ne xemgîn û ne jî şikestî bûm dema leşkerên dagirkeriya Tirk min girtin, lê belê ez xemgîn bûm dem erka me nehat serxistin, ji ber ku Rêber Apo bawer bû ku em ê vê erkê serkeftî derbas bikin û ev yek ji bo min bû êşek, her ku ez rexnedayinê bidim jî wê kêm be.”

**Cezayê hate hetayê li ser Baz hat birîn**

Di wan salên ku Baz hat girtin û wî birin girtîghên Tirkiyê, îşkenca û binpêkirina mafên girtiyan bi awayekî pir hişk dihat kirin, lewma dema ku Baz derbasî girtîgehê dibe ew rêya tekoşîn û berxwedaniya Mezlûm Doxan, Kemal Pîr, Mehemed Xeyrî durumş û hwd… da li pêşiya xwe, dewleta Tirk nikarî bû îrade girtyan têk bibe, berovajî wê her ku roj derbas dibûn Baz û hevalên xwe asta tekoşîn û berxwedanê bilindtir dikirin. Cezayê hate hatayê li ser Baz hat birîn û di îşkenceyekî pir giran re derbas bû, gelek kes dibin îşkenciya ku dewleta tirk dide meşandin, dihatin şehîd xistin. Di heman demê de ew kiryar û binpêkirinên dewleta Tirk a dagirker yê ku li hemberî girtiyan dide meşandin, ne karê microvan bû, li gor ku tê gotin ev kiriyar cinawer jî nakin. Baz û hevalên xwe bê sûc bûn, ne hêjia bû ku ewqas êş û zilim bibînin. Lê neyar wan sûcdar dibînin, ji ber ku daxwaza Kurdistanekî azad û serbixwe dikin, di heman wextî de li hemberî kiryarên dewletên hegemon derketin û bindestî ji xwe re qebûl nekirin.

Li gor ewqas îşkence û zextên li ser Baz û hevalên wî, ew rûhê berxwedanê li cem wan her zindî ma, mîna mûma hêviyê di hundirê ruhê wan de roj bi roj geştir dibû. Baz anî ziman ku tişta wan li ser piyan hişt û teslîmiyetê ji xwe re qebûl nekin, rûhê berxweda zindana bûn, di heman demê de fikir û felsefeya Rêber Apo bû.

**Baz fikir û armanca xwe ji teslîmiyetê mezintir ditdît**

Di dîroka mirovan de tu kes nikarî bû ku bi rehekî wiha geş, gerin, berxwedanî û tekoşînê bi salan di girtîgehê de bijî, lê Baz û hevalên xwe ne wekî tu kesî bûn, ji ber ku xwedî fikir û armanc bûn ne dijmin û ne jî dewletên cîhanê karîbûn wan bandir bikin da ku teslîm bibin, Baz fikir û armanca xwe ji teslîmiyetê mezintir didît. Baz û hevalên xwe her rojekî girîng di dîroka Kurdan û Tevgera Azadiyê de di hundirê girtîgehan de pîroz dikin wekî ku di nava hevalên xwe yên derve de ne.

**‘Girûra Însan, Îşkence Têk dibe, di heman demê de Bimre Faşîzim’**

Leşkerên Tirkan her car mîna gurên hov ku av ji devên wan diherike xwe li deriyên hucreyan didan, di hemand emê de bi gurim gurima lingên wan xezeba kîna hundirê wan zêde dibû, li vir jî dema derbasî hucreyê dibûm li her hevalekî bi awayekî hovana destdirêjî û gotin ji wan re dihat gotin, lê wiha tenê derbas ne dibû, li hemberî wê baz û hevalên xwe dest bi silogana dikirin û digotin‘Girûra Însan, Îşkence Têk dibe, di heman demê de Bimre Faşîzim’ di van kîliyan de hemû girtî bi yek dengî ew girtîgeh dihejandin bi siloganan, li vir leşkerên Tirk paş dizîvirîn dighîştin astekî ku poşman dibûn, baz û hevalên xwe ew bindestî qebûl nedikin, heta di girtîgehan de ew bi hemû cureyên çalakiyên xwe bi ser diketin. Di heman dewmê de baz û hevalên xwe çalakiyên gireva birçîbûne dan destpêkirin û dewlet kirin nava zextên giran ku êdî ew qebûl nakin wiha kiryar û îşkence li ser wan were kirin. Her wiha dewlet jî ji çalakiyên Baz û hevlên wî ditirsiyan, ji ber ku daxwazname di raya giştî re dihat şandin û dewleta Tirk neçar dima ku girtiyan gyhdar bike û daxwaza wan bi cih bîne.

**Baz û hevalên xwe girtîgeh veguheradibûn Akademiya Rêber Apo**

Baz da zanîn ku ew di nav çar dîwaran de bû, lê nehat wateya ku dewleta Tirk mejî û rûhê wan jî bide girtin. Berovajî wê di hundirê her girtîgehekê de perwerde û pirtûkên Rêber Apo dihat xwendin, ew girtîgehên dewleta Tirk a dagirker veguheradibûn akademiya Rêber Apo, Baz û hevalên xwe bi fikir û felsefeya Rêber Apo girtîgeh ji xwe re ronî kirin. Baz teqez kir ku ew di salê de 3 dewreyên perwerdeyên li ser fikir û felsefeya Rêber Apo diqedandin, di heman demê de her dewreyek jî li ser nave hevalekî şehîd dihat destpêkirin.

**Dewleta Tirk û sûcên mirovahiyê**

Dewleta Tirk her qurnastî dikir, gelek girtî nexweş diketin, wan derman û tedawî nedikir, gelek girtî ji ber sedemên nexweşiyên giran gihîştin asta şehadetê,di herî dawî de ji bo ku ew sûca ku girtî di hundirê girtîgehan de nayên dermankirin, wan dihştin heya ku bizanibin rewşa wî ya tenduristiyê giran bûye û ber bi şehadetê ye, wan ji girtîgehê derdixtin, tenê ji bo ew kiryar û sûcên xwe veşêre. Baz Efrîn diyar kir ku pêwîst bû zêdetirî 30 salî di girtîhehê de nemîne û wiha dewam kir: “Dewleta Tirk a dagirker pêwîst bû di derbas kirina 30 salên min di girtîgehê de, cezayê min bidawî kiribane û min ji girtîgehê derxistibane, lê ez 31 salî di girtîgehê de mam. Lê ev ji bo min nexem bû, ji ber ku kesê 30 salî karîbû di nava çar dîwaran de bijî, wê karî be heya dawiya temenê xwe jî di nava çar dîwaran de bijî. Lê dema ku ez ji girtîgehê derketm min hîn zêde hêz girt ku çawa gelên Rojavayê Kurdistanê bi rûhekê gerim û tije berxwedanî şoreşa li dar xistine û gelek destkeftî bi destxistina, ev cihê serbilindiyê û şenaziyê ye.”

## Tundûtujiya dijî jinê



**Hafiz Ahmet Turhalli**

Di sala 1999’an de ji bo balkişandina li ser şideta li ser jinê neteweyên yekbûyî (UN) ev roj pejirandiye. Bê guman ev roj ji bo balkişandina vê felaketa ser mirovahiyê, gelekî girîng û watedar e.
Jiyana mirovahiyê bi hebûna jinê dest pêkiriye.
Lê bi hezaran salan e jin ji hêla mêran ve tuşî şîddetê tên. Di sedsala me ya îroyîn de jî bi sedhezaran jin dibine qurbaniyên vê tundutujiyê. Ev birîna mirovahiyê her diçe mezintir dibe û mirovahî nagihêje aramiyê.
Ji bo jiyaneke aram û bi kêfxweşî were derbaskirin, divê tundûtujiya dijî jinê, demlidest were rawestandin.
Pirsgirêka şîdeta dijî jinan, roja me ya îro jî pirsgirêka herî cîdî ya mirovahiyê ye.
Weke mirov divê em hemû vê tekoşînê bilind bikin.
Carna bi navê ol, carna bi navê orf û adetan, carna bi navê bîrdoziyan ev zilm tê rewakirin.
Li gor ola Îslamê û misilmanan divê ev pirsgirêk carekî din were şênberkirin.
Qur’ana pîroz weke muxatep, mirov esas digre û bi nav dike.
“Birastî me nesla mirovî ji heman xwelîyê afirand”
(Mumînun 12)
“Gelî bawermendan li Jinan zordarîkirin ji were ne helal e”. (Nîsa19)
Zordarî û zilma li jinan heram e, divê kesê/kesa bawermend tekoşîna dijî zilm û neheqiyê bilind bike, ev fermana Qur’ana pîroz e.
Li gor Qur’ana pîroz; Jina baş an zilamê baş heye û hemû mirov li gor kiryarên xwe tên nirxandin. Di îbadetan de û başîyan de ji bo zilam du xêr û ji bo jinan yek xêr nîne û kesekî nikare vê tiştî bîne ziman.
Ji bo gunehan an nebaşiyan ji bo zilaman cezayeke û ji bo jinan du ceza nînin. Ger rastiya Qur’anê ev e; wê demê vê neheqî û zilmê, kê û kîjan hişmendî belav dike.
Bê guman kesên ji bo desthelatê tevdigerin ji xwe û kiryarên xwe yên qirêj re rewabûnan digerin, ji bo vê rewakirina zilmê jî, ya ol yan jî Orf û adetan bikar tînin.
Ji ber piştî koça dawî ya pêxember, ol ji bo desthelatê hate bikaranîn, şîdeta ser jinê jî carekî din dest pêkir. Di Qur’anê de ji bo tundutujiya li ser jinan helal bikin, şîroveyên şaş ku diji hizra Qur’an û sunneta pêxemberin pêşxistin.
Weke Mînak: “Gelî jinan ger we mafê zilamên xwe li ser xwe zanibiya, weyê toza bin lingên zilamê xwe serû çavên xwe bidana”. (Ahmed. B. Hanbel Musned)
Bi riwayetkirina hedîsên derew û îftîra li Xwedê û Pêxember sXl zilma ser jinan jî di civakê de rewa kirin.
Lê ev nêrîn û raman dijberî Qur’an û jiyana Pêxemberin.
Qur’an hemû cureyên neheqiyê heram kiriye!
“Jinên bawermend û zilamên bawermend dostên hevdu ne”. (Tewbe 71)
“Xwedê ji we daxwaza başî û qenciyê dike ji bo jinan. Lewre ew dê, keç û xaltîkên wene.”
Kê li hevjîna xwe bixe, Ew kes dibe dijberî Xwedê û Pêxemberê wî. Dê Xweda û Pêxember di roja qiyametêde bibin neyarê wî kesî”
“Kesên xwedan şeref û esalet qîmetê didin jinan, kesên xirab û pîs jinan piçuk dibînin.
Ev Hedîs û Ayetên me vê dawîyê ji wre nivîsandin rastiaya Îslamê didin nîşandan.
Lê gellekî tiştên kşu şîdeta ser jinê rewa dikin bi navê Pêxember û Aliman hatine nivîsandin. Divê ev şaşî hemû li gor Qur’an û Pêxember carekî din werin serestkirin. Kesê şîdetê bi navê Îslamê dijî jinê bikar bîne, divê hemû Bawermend dijiyatiya wê kesê bikin. Ev fermana Quran û Pêxemperê me ye. Bi hêviya tunebuna şîdeta dijî jinê, roj û tekoşîna mirovahiyê pîrozb e.



# Ji destpêka salê û heta niha zêdeyê 8 hezar kes li Sûriyê hatine kuştin

Piştî ketina rêjîma Baas û bi hatina hikumeta veguhêz rêjeya kuştin, revandin û sûcên dijmirovî gihişt asteke xeternak, herwiha li ser destê çekdarên girêdayî hikumeta veguhêz bi dehan komkujî pêk hatin. Ji destpêka sala 2025’an ve û heta niha li Sûriyê zêdeyî 8 hezar kes hatine kuştin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Di 8’ê Çileya 2024’an de Baas hate hilweşandin**

Rêjîma Baas a ku 60 salan li ser desthildariyê ma, di 8’ê Çileya 2024’an de hate hilweşandin, herwiha weke tê zanîn piştî ketina Rêjîma Baas HTŞ`an jî hikumeta veguhêz a Sûriyê ya ku serokê wê Ehmed El- Şeri bi destê hin hêzên navnetewî û herêmî hate li ser deshildariya Sûriyê.

**Piştî hatina hikumeta veguhêz hêviya gelê Sûriyê hate şikandin**

Xewin, hêvî û xeyala tevahiya gelê Sûriyê ew bû ku piştî ketina rêjîma Baas Sûriyeke pirreng û demokratîkî were avakirin. Lê mixabin piştî hatina hikumeta veguhêz a Sûriyê li ser desthildariyê ew hêvî û xeyalên tevahiya gelên Sûriyê pêk nehat. Hikumeta veguhêz ji destpêkê û heta niha a ku serokê wê Ehmed El-Şera tenê yek rengî û yek alîbûnê dixwaze û hewl dide vê hişmendiyê li ser gelê Sûriyê feriz bike, komkujiyên ku li berava Sûriyê û Sûwêdayê hatin kirin vê yekê tekez dikin. Hikumeta veguhêz mafê hemû pêkhateyan û bi tayebet mafê jin di destûra Sûriyê ya nû de paş guh dike, ji ber vê yekê gelê Sûriyê bi tu awayî vê hikumeta bi vî rengî qebûl nake. Em dibînin ku ji dema hikumeta Şamê ya veguhêz hate li ser desthildariyê aloziya Sûriyê hîn kûrtir bûn, ew bi piştevaniya hêzên heremî û cîhanî hate ser desthilatiyê û wê bawerîya gelê Sûriyê negirtiye û nikare Sûriyê bi rêve bibe. Ev hikumet bi hişmendiya DAIŞ’ê komkujiyan li ser jinan û tevahiya pêkhateyên Sûriyê dide meşandin û dixwaze ku reşkirinê di navabera pêkhateyên herêmê de derxe hole û armanca wê parçekirina Sûriyê ye.

**Armanca hikumeta veguhêz parçekirina Sûriyê**

Bi hatina hikumeta veguhêz a Sûriyê re rewşa Sûriyê aloztir bû ye, vê hikumetê di 8’ê Adarê de bi hinceta ku Elewî bermayiyên rêjîma Essed in, gelek komkujiî li dijî wan pêk anîn, herwiha di 16’ê Tîrmehê de li dijî civaka Durzî komkujî hatin pêkanîn. Vê carê jî hinceta wan ew bû ku Durzî alîgirên Îsarailê ne. Beriya wê jî li Sser xirisyayan gelek gef hatin xwarin. Di heman demê de li dijî gelê Kurd jî gelek caran gef xwarine û hewil didin tevliheviyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê derxin. Helbet ev yek xeteriyeke mezin ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahî Sûriyê tîne. Armanca hikumeta veguhêz a Sûriyê parçekirina Sûriyê, ev siyaset û kiryarên ku ev hikumet dide meşandin berê Sûriyê dide parçebûnê.



Di 10’ê Adara 2025’an de di navbera Fermandarê Hêzên Sûriya Demokratîk QSD’ê Mezlûm Ebdî û hikûmeta veguhêz a Sûriyê de peymanek ji 8 xalan hate îmzekirin. Lê tevî derbasbûna 8 mehan di ser peymanê re hikumeta veguhêz a Sûriyê pabendê peyamanê nabe û xwe dûr dixe. Ji ber ku hikumeta veguhêz ne bi xwesetka xwe tevdigere bi xwesta dewêletên ku naxwazin li Sûriyê aramî û aştî pêk were, tevdigere.

**Kiryarên hikumeta veguhêz a Sûriyê**

Li gorî Rewangeha Sûrî ya Mafê Mirovan ji destpêka ketina rêjîma ji meha destpêkê heta meha Cotmehê 7 hezar û 884 kes hatine kuştin. Herwiha di meha mijarê de nêzî 100 kesî hatine kuştin.
Hikumeta veguhêz a Sûriyê li berava Sûriyê li dijî civaka Elewî gelek komkujî li dijî wan pêkanînin, li gorî Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyê heta miha Îlonê zêdyî 1700 kes ji pêkhateya Elewî hatine kuştin.
Ji destpêka sala 2025’ê heta li herêma Siwêda têkoşîneke mezin ji hêla Durziyan ve hat kirin. Di meha Nîsan û Gulanê de, li dijî pêkhateya Durzî kiryarên dijmirovî ji hêla hikumeta veguhêz a Sûriyê ve pêk hatin. Roja 13’ê Tîrmehê, bi destê HTŞ’ê tevlîheviyek di navbera Durzî û Erebên Bedû de çêbû. Roja 26’ê Tîrmehê, hejmar di navbera hezar 120 kes heya hezar 420 kuştî hatin ji hêla Rewangeha Sûrî ya Mafê Mirovan ve hat belgekirin.

**Şêwazê hikumeta veguhêz Sûriyê bêhtir aloztir dike**

Ev hikumeta veguhêz a Şamê kesên sûcdar û kojerên mirovan di nava rêveberiya xwe de erkdar dike. Serçeteyê mîna Mihmed Casim Ebû Emşa û Hatim Ebû Şeqra ên ku destê wan di kuştina jinan û gelek welatiyên Sûrî de heye weke fermandar di nava artêşa Sûriyê de wan bi cih dike. Piştî wê dîsa me dît ku hikumeta veghêz a Şamê serçeteyê girêdayî dewleta Tirk a dagirker û kujerê siyasetmedara Kurd Hevrîn Xelef, Hatim Ebû Şeqra weke fermandarê ferqeya 86’an li herêmên Dêre Zorê, Reqa û Hesekê hate erkdar kirin. Ev serçeteyên bi vî rengî ku di nava hikumeta veguhêz a Şamê de tên erkdarkirin zagonên mafên mirovan binpêkirine û bi hezaran sûcên şer kirin e. Ev serçeteyên di nava hikumeta veguhêz de cihê xwe digrin di asta navnetewî de jî mîna kesayetên tûndrew û sûcdar tên e naskirin. Ev kesên sûdar bi tu awayî wê nikaribin Sûriyê bi rêve bibin û ev şêwazê ku HTŞ’ê pê Sûriyê bi rêve dibe wê rewşa heyî hîn bêtir alûztir bike.

**Sîstema herî guncaw ji bo Sûriyê sîstema nenavendî ye**

Tevahiya pêkhateyên Sûriyê, Sûriyeke Demokratîk, nenavendî, yekalî û pirrengîn dixwazin û dibêjin ku sîstema herî guncaw ji bo Sûriyê sîstema ne navendiye. Ji bo ku Sûriyeke Demokratîk û nenavendî were avakirin, pêwîste tevahiya pêkhateyên Sûriyê bi erkê xwe rabin û li dijî siyaseta şerê taybet ya ku tirkiyê û çeteyên pêve girêdayî dide meşandin her tim di nava têkoşînê de bin û ji bona siberoja Sûriyeke demokratîk yekîtî û hevgirtina xwe xurtir bikin.

# HTŞ’ê bi feraseta serdema qiraliyetê li demokrasiyan dinêre

**Ehmed Hesen**

Tevî ku salek di ser ketina HTŞ’ê ya Şamê re derbas dibe jî, lê rastiya ku tê jiyankirin gelek pêşbînî û hêviyên ku ji vê hikûmeta ku di navbera pêvajoya avakirin û tunekirinê de dijî berovajî dike, HTŞ’ ê di 8ê berfanbara 2024an de bi awayekî Şam û deverên bakur û rojavayê Sûrîyeyê desteser kirin û xwe weke sîstemeke dewleta netewe ya klasîk û dawiya xwe jiyan dike ragihand, her wiha dest bi serdanên welatên derve kir û hewl da ku ji nasnameya xwe ya cîhadîst-selefî ya li qada navneteweyî navdar bûye, veguhere nasnameyeke modern a ku bi mêjiyê tûndrew û paşverû cîlakirî, di heman demê de ji bo dabînkirina



ewlehiya Îsraîlê derî heta dawiyê li ber tesfiyeyên navxweyî vekir û asîmana Sûriyeyê ji balafirên Îsraîlê re bû armanceke xweparastinê ya Îsraîlê, Colanî ji rewşa kesekî ku di qadên navdewletî de terorîstekî ku serê wî berdêla 10 milyon dolar bû, veguherî şêfekî moderniteya kapîtalîst ku nûnertiya şerê li dijî terorê dike, li vir vê yekê gelekî kêfa dewleta tirk bir û ev guhertin ji bo dagirkeriya xwe bidomîne û guhertina demografîk berfireh bike ji dewleta tirk re weke pilateke ji zêr hate pejirandin, lê metirsîyên Îsraîlê û hêzên modernîst ji niyetên dewleta Tirk her tim zêde bûn û ya ku hikûmeta AKP-MHP’Ê meraq dikir hêdî hêdî li badilhewa çû, sîstema ku niha li Şamê qaşo rêveberiyê dike ne tenê dişibihe serdema qiraliyeta Sumer û monarşiyan, her wiha xwezaya zagonsaziyan derbas kiriye û serî li paqijkirina etnîkî daye, zimanê siyasetê yê hikûmeta Şamê heta niha jî ne zimanê lihevkirin û çareseriyan e, berovajî wê parçekirina îdarî, siyasî û çandî jiyan dike, her çend hikûmeta Şamê têkiliyên xwe bi dewletên cîran re baş bike jî, lê nexweşiya wê ji nava wê ye û pêwîstî bi rakirina pençeşêra komên cîhadîst heye, nimûneyên wê jî gelek in:
Hema mehek jî di ser hatina HTŞ’ê re derbas nebibû, komên cîhadîst perava Sûrî û herêmên durzî û elewiyan veguherandin qadên bi komkujî û tesfiyekirina gelê Elewî û durzî dagirtî, ev feraseta heyî nikare bi demokrasiyan re li hev bike û bi vê yekê bidome, wê xwe kuştineke hêsan be û dawî li sîstema li Şamê bê anîn, serdana 8’ê mijdarê ya Ehmed El Şer’i ji Emerîkayê re ne serdaneke ji rêzê bû, di bingeha xwe de danîna hîmê gelek stratejiyên Emerîka yên demdirêj li Sûriye bû, ragihandina Emerîka ji avakirina baregehên nû li Sûriye û berfirehkirina operasyonên dijî DAÎŞ’ê bi hevkariya Hêzên Sûriye Demokratîk li deverên di bin kontrola hikûmeta veguhêz de, mesajek e ku Şer’ i di mecbûriyeta daxwazên Emerîkayê de dixebite û Îsraîlê rihet dike, di encamê de wê teqînek di qada artêşê de rûbide, ji ber piranî serbazên berê yên DAIŞ’ê niha di nava artêşa Sûrî de cih digirin, ev gava Şer’ i wê tevgera van koman qels û sînordar bike û rê li ber tesfiyekirina wan veke, ne wisa be nikare rewamendiya xwe ji hêzên hegemonîk bistîne û li ser serweriyê bê hiştin, di heman demê de armanc ew e ku komkujiyên li perava Sûriye û sehil werin jibîrkirin û paşperdekirin.

# Bendavên Tirkiyê; siyasetek ji bo meşandina şerê avê

Dewleta Tirk da ku şerê avê wekî beşekî ji siyaseta xwe ya qirêj li dijî Rojavayê Kurdistanê bimeşîne, ji salên 60'î heya roja îro nêzî 20 bendavî li ser çemên Firat û Diclê daye avakirin. Herwiha bi sedema vê siyasetê ava binerd û sererd a Rojava di metirsiyê de ye.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

### Avakirina bendavan li ser çemên Dicle û Furatê

Dewleta Tirk li ser van herdu çemên istratejîk derdora 20 bendav dan avakirin. Bendava Kîpan yekem bendav e ku li ser çemê Firatê ava bûye, ji sala 1966'an dewleta Tirk dest bi avabûna wê kir û di 1974'an de bi dawî kir. Herwiha ji mezintirîn bendavên ku dewleta Tirk ava kirin, Bendava Etaturk(Atatürk) e ku ev bendav di sala 1992'an de weke mezintrîn bendav li ser asta Tirkiyê û Kurdistanê, hem jî girîngtirîn bendavên cîhanî li ser çemê Firatê piştî 10 salan ji kar û xebatê hat avakirin. Di heman demê de dewleta Tirk di sala 2006'an de dest bi avakirin Bendava Ilîso li ser çemê Diclê kir, di sala 2020'an de jî bi dawî kir, ev bendav dikeve asta duyemîn bi mezibûna xwe piştî ya Etaturk. Ji bilî van bendavan, hin bendavên din li ser çemên Firat û Diclê hene û dîroka avakirina wan di navbera salên 1980 heya salên 1990 û 2000'î de ye. Bendavên girîng û mezin ên ku li ser Bendava Diclê hatine avakirin ev in: Bendava Dicle, a Silûpî(ev bendav jî tê avakirin) , a Batmanê, a Ilîso, a Kiralkizî û di dema heyî de jî bendavek li ser Diclê bi navê Cezre(Cizîr) li Şirnaxê tê avakirin. Li aliyê din bendavên ku li ser çemên Firatê hatine avakirin ev in: Bendava Kîpan, a Karakaya, a Atatürk, a Karkamiş, a Kemal Kiliç û a Birecik.

### Rewşa ava Firatê û siyaseta tîkirina herêmê

Peymana 1987'ê navbera Tirkiyê û Sûriyê weke yekem car hat îmzekirin ji bo rewşa avê û rêjeya ava Firatê. Di wê peymanê de Tirkiyê rêjeya ava Firatê destnîşan kir, herî kêm 500 m³ para Sûriyê be. Lê kirîza ava hemû çemên Rojavayê Kurdistanê di dawiya sedsala 20'an de dest pê kir. Wekî tê zanîn 6 çemên serek û bi 10'an çemên din ên biçûk hene. Av di tevahiya çeman de diherikî, rewşa ava erd û binerd baş bû, lê dema ku bendavên Tirkiyê li ser çeman hatin avakirin piraniya çeman hatin miçiqandin û ava hin ji wan kêm bû, êdî ji wê demê ve rewşa avê û avhewaya Rojava û Sûriyê bi giştî hat guhertin û kirîz bi xwe re anîn. Bi taybet çemê Firatê ew jêdera sereke ya avê ye ji bo herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Di salên dawî de rêjeya ava Firatê bi awayekî xeternak ber bi jêr ve bûye.Li gorî ANHA'ê dewleta Tirk asta ava Firatê kêm kirye û bûye 200 m³/s. ANF jî di nûçeyeke xwe de tekez dike ku ji sala 2021'an ve Tirkiye tenê 200 m³/s para ava Firatê berdide. Herwiha li gorî Rewangeha Mafê Mirovan a Sûriyê hat diyarkirin ku di hin deman de ava çemê Firatê digihêje 250 m³/s.

### Tirkiyê şerê avê dimeşîne û herêm ber zuhabûnê ve dice


Wekî tê zanîn çemê Dicle û yê Firat du çemên herêmî ne, ava wan ji çiyayên Kurdistanê der tê. Lê ji ber ku gelê Kurd û cotkarên



Kurdan li Rojava û Başûr sûd jê werdigirtin, dewleta Tirk dest bi projeyên xwe kirin. Rewşa herêmê ber bi zuhabûnê ve diçe, pispor û lêkolînerên ava binerd vê yekê xeternak dibînin ji ber ku xezîneya ava herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê her ku diçe kêmtir dibe, berî salên ziwahiyê ango berî 10 salên derbasbûyî rêjeya ava binerd ji 40 metreyan heya 60'î kûr bû, lê di dema heyî de zêdeyî 75 metreyan e, sedem ji kêmbarîna baranê û zuhabûna çemên ku jêdera wan Bakurê Kurdistan û Tirkiyê ye.

### Encamên pirsgirêka avê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û çareserî

Siyaseta dewleta Tirk a ku di çarçoveya şerê avê de dide meşandin xwedî bandor e li hemû warên jiyanê. Nemaze kêmbûna avê vexwarinê di gelek herêman de, nimûneya vê yekê qutkirina ava stasyona Elok a bajarê Serêkaniyê. Ev yek hişt ku kirîzeke avê li bajar û gundewarê Hesekê derkeve û bi hezarên şîneyên wê bêav û elektrîk bimînin. Zêdebûna bihayên xwarin ji ber kêm hilberîna çandinî û çeksaziyê, rewşa çandiniyê ji ber kêmbarîna baranê û miçiqandina çemên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di salên dawîn de lawaz bûye. Di encamê de jî ava binerd kêm bûye. Eger siyaseta dewleta Tirk a tîkirina gelê Kurd û tevahiya gelên Barku Rojhilatê Sûriyê bidome wê kirîzên mirovî rûbidin. Lewma jî pêwîst e hin gavên çareseriyê bên avêtin, yek jê îmzekirina peymaneke dawî weke peymana 1987'ê, di encamê de jî para ava Rojava ji Firatê were dayîn. Hem jî ava çemê Diclê nekeve bin xizmeta siyaseta dewleta Tirk û li gorî pîvanên exlaqî û xwezayî ava wê biherike. Di heman demê de divê hemû çemên ku ji hêla Dewleta Tirk ve hatine girtin, werin berdan. Herwiha pêwîst e hemû saziyên eleqedar û rixisên navneteweyî, hem jî komeleyên avê yên cîhanî bibin navbênkar ji bo çareserkirina pirsgirêka ava Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Di heman demê de çareseriyek ji hemû bendavê ku av di wan de dimîne, were dîtin.



## Du Darên Qereçoxê û Bîranîna Civakekê

**Sînan Cûdî**

Her çîrokeke ku li Rojava tê gotin xwe bi cihek ve digre. Di siya çiyayekî de, di tevnê kevirekî de, di şaxên darekê de. Li vê axê, cîh vebêjek bêdeng e. Ger mirov nebêje, ew vedibêje.
Qereçox yek ji van vebêjên herî kevin e.
Li serê çiyê du dar hene: Keçika Kezî û Lawikê Rêyan.
Efsane dibêje ku bîranînên du ciwanên ku li hev digerin di van daran de hatine çandin. Yek ji wan xortekî ye ku rêwîtiyek dirêj dike, yê din jî jineke ciwan e ku li dû xwe hiştiye. Ew ne dîsa digihîjin hev û ne jî bi tevahî ji hev vediqetin. Çîrok bi xwe di nav vê valatiyê de dijî.
Xelkê herêmê van her du daran veguherandine cihekî ku daxwaz û dua lê tên kirin. Paçikên ku di bayê de dihejînin ne tenê daxwaz in, lê belê îfadeya barê hundurîn ê mirovekî û dawîya dawî ya civakekî ne.
Ev dar ne tenê xemlên efsaneyekê ne. Ew nimûneyek berbiçav e ku çawa hest û bîranîn di çanda devkî ya Kurdistan û Mezopotamyayê de têne veguheztin. Ne ecêb e ku meriv bibîne ka mijarên wekî evîn, windakirin û lêgerîn, ku di vegotinên Dengbêjan de belav dibin, çawa li vir bi darekê ve girêdayî ne. Hest û bîranînên vê civakê pir caran bi girêdana bi cihekî ve têne şekilkirin.
Erê, guherîna bilez a ku îro li Rojava tê jiyîn, birînên ku ji ber şer mane û şikestina di navbera nifşan de hin vegotinan qels dike. Hin çîrok têne di bîranînên çend mezinan de veşartî dimînin. Hin rêûresm tenê ji hêla çend kesan ve têne meşandin. Ji ber vê yekê, nihêrîna li du daran li Qereçoxê ne tenê nihêrîna efsaneyekê ye. Ew nihêrîna nîşanek e ku civak çawa xwe bi bîr tîne.
Bîra gel tenê bi nivîsandinê nayê parastin. Bîr, carinan di kevirê li qiraxa zeviyekê de dijî, carinan di qiraxa çemekê de, carinan di qurmê darekê de. Wekî van her du daran.
Her perçeyek paçikê mîna peymanek piçûk di navbera paşeroj û niha de ye.
Nîşanek bêdeng ku dibêje, “Em li vir bûn, û em tînin bîra xwe.”
Her du darên Qereçoxê di nexşeya hestyarî ya vê herêmê de cîhek taybetî digirin. Yek ji wan sembola rêyeke windabûyî ye, ya din jî lêgerînekê ye. Dema ku bi hev re têne dîtin, israra civaka Rojava ya li ser parastina bîranînê eşkere dibe. Ji ber vê yekê, eleqeya bi van her du daran re ne tenê kevneşopiyek e. Bi rastî, ew hewldanek e ji bo parastina girêdanek bi rabirdûyê re.
Piştî salan, dema ku kesek hilkişe Qereçoxê û li ber van her du daran raweste, ew ê ne tenê efsaneyek bibihîze. Ew ê hest, hêvî, windahî û şêwazên berxwedanê yên mirovên ku li van axan dijîn jî bibînin. Bîr carinan di kevir de dijî, carinan di avê de, carinan di du daran de. Qereçox yek ji wan cihan e ku vê yekê tîne bîra me.
Çiya bêdeng radiweste, lê bîr li dora wî diaxive. Em tenê hewl didin ku wê axaftinê bibihîzin.

# Wê şandeyek ji çar kesan pêk tê biçe Îmraliyê

**Piştî ku Komîsyonê Meclisê biryara hevdîtina bi Rêber Apo re da, hate destnîşankirin ku şandeya biçe Îmraliyê wê ji çar kesan pêk bê û serê hefteya bê biçe Îmraliyê.**

Komîsyona Hevgirtina Neteweyî, Xwişk-Biratî û Demokrasiyê bi piraniya dengan hevdîtina bi Rêber Apo re qebûl kir. Li gorî nûçeya Ajansa Mezopotamyayê, di dengdayîna li komîsyonê de AKP, MHP, DEM Partî, TÎP û EMEP'ê bi erênî deng dan û Koma Yenî Yolê jî bêlaî tevgeriya. Partiya Demokrat, HUDA-Par, Partiya Demokratîk Solê jî bi neyînî deng da.



### CHP û Partiya Yenîden Refahê jî tevli dengdayînê nebûn

Pêşniyaza Koma Yenî Yolê ku xwest bi rêya SEGBÎS'ê hevdîtin bi Rêber Apo re bê kirin, bi piraniya dengan hat redkirin. Li gor agahiyên bi dest ketin, hevdîtin dê serê hefteyê pêk bê. Dê ji komîsyonê şandeyeke ji çar kesan pêkhatî bê avakirin û kesên di vê şandeyê de dê li ser navê komîsyonê hevdîtinê pêk bînin.
DEM Partiyê duh daxuyandibû ku ger hevdîtin bê kirin dê di şandeyê de Seroka Koma Meclisê Gulistan Kiliç Koçyîgît cih bigire. Cîgirê Serokê Giştî yê MHP'ê Fetî Yildiz jî beriya civîna komîsyonê gotibû ew ê jî di şandeyê de cih bigire. AKP û Koma Yenî Yolê hê kes diyar nekirine. Li gor agahiyan; dê AKP Huseyîn Yayman bişîne. Koma Yenî Yolê jî hê li ser nav nîqaşên xwe didomîne. **ANF**



# ‘Îradeya QSD’ê moralê gel e’

Endama Ofîsa Jin Macîda Ehmed destnîşan kir ku QSD'ê bû desteka civakê û qalibên zilmê şikandin. Herwiha Endama Meclisa Malbatên Şehîdan Suad Mistefa jî da zanîn ku gelê berxwedêr wê hertim li pişta hêzên QSD'ê be.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Hêzên Sûriya Demokratîk ji roja yekem a damezrandina xwe ve, armancên ku dixwazin bi dest bixin, bi awayekî zelal eşkere kirine. Di heman demê de isbat kirine ku hêza herî bi disîplîn û bibandor e, li ser rûbera Sûriyê. Herwiha ezmûnên leşkerî yên mezin jî derbas kirin, ku tê de karîbûn serkeftinên ku hatine piştrastkirin bi dest bixin û bandoreke erênî li seranserî Sûriyê bikin.
Di derbarê Piştgiriya QSD'ê û têkçûna pilanên çeteyan endama Meclisa Malbatên Şehîdan Suad Mistefa û endama Ofîsa Jin Macîda Ehmed ji rojnameya me re axivîn.

### ‘Gel li pişta hêza xwe ye’

Endama Meclisa Malbatên Şehîdan Suad Mistefa da zanîn ku gelê berxwedêr hertim li pişta Hêzên QSD'ê ye û wiha got: “Li seranserî



Suad Mistefa



Macîda Ehmed

Sûriyê bûyer û geşedan li dar dikevin û her kes bi çavên xwe dibînin ku cihên herî bi ewle yên Rêveberiya Xweser in, ji ber projeya ku li ser dimeşin, hemû gelan digre nava xwe. Lê mixabin gelek girûpên xwefiroş hene dixwazin vê projeyê reş bikin û guftogoyan derxin. Hijmarek ji kesên ku mirov dikare wan li ser destan bihijmêre li dijî berxwedana QSD'ê derdikevin kolanan. Bila di wê baweriyê de bin ku tu hêz li cîhanê nikarîbû DAIŞ bişkîne, QSD'ê bi derfetên xwe yên kêm, bi hêz û moralekî bilind karîbû DAIŞ'ê bişkîne û isbat bike ji cîhanê re ku ew in xwediyê vê axê. Lê dilê dijmin û çeteyên wê rehet nebû, wan projeyeke din dan destpêkirin û êrişî Bendava Tişrînê kirin, da ku gel ji hev veqetîne û bide xuyakirin ku QSD'ê nikare gel biparêze. Hat dîtin Şerê Gelê Şoreşgerî çawa mil bi mil bi QSD'ê re bû û piştgirî dida hêza xwe.”

### ‘Îradeya QSD’ê moralê gel e’

Suad Mistefa da diyarkirin ku îradeya QSD'ê moralê gel e wê tucarî gel gavek paş de ne avêje û wiha domandin: “Ev kesên ku kiryaran li dijî QSD'ê dikin eger sax tên, wê kuştî vegerin, ew bi sol tên wê pêxwas vegerin, ew bi siwar tên wê peya birevin ji ber ku xulekekê tenê nikarin li dijî QSD'ê destê xwe bilind bikin, ji ber ku gel li pişta hêza xwe ye, çete wê tucarî negihêjin armanca xwe. Dayîkên şehîdan û jinên ku di hundirê Sûriyê de jiyan dike, dibêjin êdî bes e ji van kesên xwefiroş re û bila nema hewildanên xwe bikin, ji ber ku tucarî îxanet bi ser neketiye û bi ser nakeve jî.”

### ‘QSD’ê hebûna gel e’

Endama Ofîsa Jin Macîda Ehmed destnîşan kir ku QSD'ê hertim bi civakê re dibe alîkar û ew bû ya ku qalibên zilmê şikandin û wiha got: “Li Dêrazor, Reqa û Tebqa bi sedan jin û malbat di bin işkenceyê re derbas dibûn û zarokên sêwî li kolanan bê xwedî hebûn, QSD'ê destek da wan û bi rihê Netewa Demokratîk karîbû wan ji vê yekê rizgar bike. DAIŞ gelê wê herêmê di bin navê isalmiyetê de dikşîne xwe ji ber dizane ew bi dîn ve gelekî girêdayîne û wê bandorê li wan bike. Lewma rastiya ku QSD'ê li ber çavan kir, dixwazin ji bîr bikin û li dijî QSD'ê derkevin kolanan. Ev kesên ku baweriya wan bi çeteyan tê, kesên bê îrade ne û tu sûdê nadin civakê. Ji ber ku ne tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, lê belê li tevahiya Sûrî ked û berxwedaniya QSD'ê tê dîtin û xeta ku ew li ser dimeşin diyar e. Em ê tucarî li kêleka QSD'ê ranebin ji ber ku ew hebûna me ye, xurtkirina bingeha wê ji bo me hemûyan esas e. Civak têgihiştiye ku dagirkerî hertim dixwaze tevlêheviyê derxe û civakê ji hev qut bike, lewma tu tişt nema bandorê li hişmendiya wan dikin. Yekxet dane pêşiya xwe bi rihê xuşk û biratiya gelan wê li pey QSD'ê bin da ku careke din Sûrî ava bibe.”

# Ayşe Acar: Em her dem li hember pêvajoyê erênî ne

**Esma Mistefa**

**Parlementera berê ya Batmanê Ayşe Acar da zanîn ku di rêveçûna xebatên komîsyonê de Tirkiyê bingehên hiqûqî û siyasî ava nekiriye û got,”Em bi erênî nêzî pêvajoyê dibin, herwiha hemû aliyên Kurdî ji bo çareseriyê û serxistina pêvajoyê zimanê xwe saz dikin.”**

Komisyona ku ji bo pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê hatiye avakirin, xebatekî dide meşandin lê di asta ku ji pêvajoyê re demildest bibe bersiv, lawaz e. têkildarî xebat û gavên ku pêwîst e bêne avêtin de, Parlametera berê ya Batmanê Ayşe Acar bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.

**Li ser bingeha banga Aştî û Civaka Demokratîk, Rêber Apo bi erkê xwe yê serdemî rabû û PKK'ê jî gavên dîrokî ji bo serxistina pêvajoyê avêtin. Lê dewleta Tirk ji bilî hin axaftinan tiştek li ser erdê nekir. Rêber Apo di îmraliyê de tê ragirtin, komisyona ava kirbûn hevdîtin pê re nekirine, dewletê ji bo çareseriyê tu gavên zagonî pêk nanîne. Hûn van nêzîkatiyên dewletê çawa dinirxînin?**

Belê; Ev pêvajo di encama nehevdîtinên bi Rêber Abdullah Ocalan re derket holê. Zextek mezin ava bû ku di parlamentoya Tirkiyê de Dewlet Bahcelî bang li Rêber Apo kir ku bila were di parlamanê de biaxive. Ji xwe li ser van bingehan gelek gavên dîrokî û serdemî hatin avêtin, ji banga Rêber Apo ya 26'ê Sibatê, Kongira PKK'ê ya fesihkirinê û marasîma sembolîk ya şewtandina çekan ji aliyê Tevgera Azadiyê ve hat pêşxistin. Herî dawî jî vekişîna ji Bakurê Kurdistanê, Tirkiyê û ji Zapê. Ev hemû weke gavên dîrokî ji bo aştiyê û xwedîderketina li banga Rêber Apo hatin kirin. Armanca ji vê yekê jî ku doza gelê Kurd derbasî qonaxa aştî, hiqûqî û siyasî bibe.
Lê belê dewleta Tirk gavên şênber neavêtiye, ji bo avakirina bingeheke hiqûqî û siyasî bi gelemperî gavên wisa neavêtine. Bingehên hiqûqî û siyasî çi ne; Îro Rêber Apo ji bo pirsgirêka Kurd bi awayekî aştiyane were çareserkirin, di dîroka cîhanê de di asta herî jor de biryarbûna xwe daye nîşandan. Rêber Apo gava herî mezin avêt û bi wê yekê re got em amadene ji bo pirsgirêka Kurd bi rêbazekî demokratîk û aştî bê çareserkirin. Ev gotin û hewildanên Rêber Apo ne nû ne, dema salên 90'î de jî anî ziman ku di agirbesta wê demê de bang kir. Di vir de Rêber Apo û Tevgera Azadiyê ji aliyê xwe ve gavên herî di jor de avêtin û biryarbûna xwe tekez kirin.
Gava em li aliyê dewletê dinêrin gavên berbiçav yên çareseriyê nayên xuyakirin, raste komisyoneke hatiye avakirin girîngiya wê jî heye ku em naxwazin bê wate bikin, di vê çarçoveyê de hin hevdîtin bi civak û saziyan re kirin û ew guhdar kirin. Lê ev komisyon hevdîtin bi Rêber Apo re nekiriye. Dema em li dîrokê dinêrin li çareserkirina pirsgirêkan dinêrin, bêyî guhdarkirina muxatebê aliyê din pirsgirêk nikarin bên çareserkirin. Ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd bi awayekî demokratîk, divê serî li muxatebê wê bê kirin yê ku proje, çareserî û paradîgmeya wî heye. Di heman demê de Rêber Apo ne tenê li ser hêza leşkerî bandor kiriye, li ser hemû beşên civakê û cîhanê kiriye.

**Ji bo pêşxistina pêvajoyê niha çi ji gelê Kurd û aliyê demokrat yên Tirkiyê tê xwestin?**

Îro li çar aliyên Kurdistanê û Tirkiyê bi milyonan Kurd hene, divê gelê Kurd li her derê werin gel hev. Çawa ku di pêngava ji bo Rêber Apo hatiye derstpêkirin de ya “Ji Ocalan re azadî û ji pirsgirêka Kurd re çareserî” helwestên xwe nîşan dan û kom bûn, gelek dost û hevalên gelê Kurd kom bûn. Ev yek bandor li ser Tirkiyê kir û famkirin



ku ne tenê gelê Kurd beşeke mezin ji piştgirên doza Kurdî û Rêber Apo çareseriyê di muxatebgirtina Rêber Apo de dibînin. Ji bo wê pêwîst e em hemû çalakiyên xwe careke din xurt bikin û bandorekê erênî avabikin, ji ber çareseriya pêvajoyê tenê bi destê Rêber Abdullah Ocalan e.

**Eger dewlet di bêgaviya xwe de bi israr be, gelo wê rewşa pêvajoyê ber bi ku ve biçe?**

Belê; Bi rastî em naxwazin bi awayekî neyênî li pêvajoyê binêrin. Ji ber îro daxwaziya me ew e ku ev hevdîtin weke pêvajoyekê berdewam bikin û bighîne asta çareseriyê. Ji ber wê bi rastî civaka Kurd, partî û saziyên Kurdî em her tim di aliyê erênî de digrin dest û zimanê xwe jî li gor vê pêvajoyê saz dikin.
Îro em dibînin ku hîna jî hin alî hene ku naxwazin ev şer biqede û xwe li ser vê şerî dewlemend û jiyan dikin, her wiha zimanê xwe jî neyînî li hember pêvajoyê bikar tînin. Ji ber wê jî em naxwazin neyînî şîrove bikin. Divê em xwe birêxistin bikin, Rêber Apo ev pêvajo destpêkir û derî vekir. Divê em li gorê wê çawa em bikaribin Rêber Apo fîzîkî azad bikin, her wiha em bi xwe û civaka Tirkiyê jî bi hev re azadiya xwe pêk bînin. Ji ber wê ez bawer im hin aliyên di dewletê de hene ku her tim derdikevin û dixwazin ev şer berdewam bike. Ji ber ger ev şer biqede, siyaset û berjewendiyên xwe diqedin û nikarin xwe di nava siyasetê de bidin jiyankirin. Li ser van bingehan divê em rêxistinkirn û hêviyên xwe yên çareseriyê zêde bikin. Ew aliyên di nava dewletê yên ku naxwazin gavan biavêjin, em bihêlin ew jî li gor pêvajoyê tevbigerin.